

Her tişt di wextê de xweş e!

Enehîte Morad

Di dîrok û kiltûra miletan de , pir çêrok û bûyerên cure-cure yên bi êş û jan di warê evînê de hene . Bêguman gelê Kurd jî di vê warê de pir dewlemend û zengîne . Bi dehan keç û jinên evîndar, zor û setem ji ber evîna xwe ve dîtine. Gerdîşên civakî yên pûç û vala , ew ên ku di hiş û ramanê me de pal vedane , em ji hestê mirovanî bi dûr xistine û bi bêbextî em pir jin dane kuştin, yên dî jî bi hêsanî ew avêtine jiyana nakokî , ew ji hemû mafên mirovan bêparkirine. Vêca jî, ta roja me îro, jin di derya êş û serpêhatiyan de li ber xwe dide . Ma gelo kî nizane ku ji hestê evînê xweştir tiştêk nîne , lê zor mixabin di bin perda navê evînê de salê bi dehan jin û keçên ciwan nemaze nifşên nûguha têne xopandin .Li encama wê yekê , rûdawên bive di civaka me de serî hildane û bihayê wê jin û keçên reben didin . Di bin perda şuştina şeref û namûsê de , kuştin ,lêdan di civaka me de berdewam e , bê ku em karibin mêr û xortan sûcdar bibînin ! .

Bese! Dem hatiye , pêwîste ku em xwe ji sîstema bavê rêzgar bikin , wekiheviya mêr û jinan di her warekî de bipejirînin , ta ku em karibin heyameke tenduristî dîrî kuştin û setemkariyê di civaka Kurd de ava bikin . Her wisan jî, zor girînge ku, em li nifşên nûguha ji keç û xortan xwedî derkevin û wan li ser riya wekhevî , dademendî bawerî perwerde bikin. Kesatiyeke rast û durist di hundir wan de ava bikin . Belkîm , bi vê awî em karibin , keç û xortên xwe, wan bi dilovanî hembêz bikin . Têkilî bi wan re, li ser riya rêzgirtin , bawerî û evînê , ne jî li ser bingeheke tirsê û kotekan ew perwrde û tomar bibin . Çi pêwîste ku,

zarokên me dê û bavên xwe li pêş xwe mezin û weke şêwrmendan bibînin . Ne jî weke hurç û hovan, ji wan bipelikînin û bazdin , herweha hestekî biyanî, di navbera xwedî û zarokan de ava bibe .

Bi boneya Cejna evînê, di -14-ê sibata -2009-an de, ji hêla rêxistina jinan ve ya Parta Yekîti ya Demiqurat a Kurd li Sûriyê –Yekîti- komcivînek li bajarê Helebê hate lidarxistin , kesên beşdar - 25-kes ji keç û jinên dilsoz bûn , pir têbînên balkêş digel gilî û gazinan pêşkêş dibûn , daxwez û hêviyên wan beşdaran bi tevgera siyasî bilind dibûn . Çi qas girînge li civaka me kurdan , tevgera siyasî xwedî derkeve û komcivînen ji vê rengî lidarxîne . Li dawî bi çepik , sitiran ,sema û reqis û pêxistina mûman , digel xelatkirina beşdaran komcivînan bi serî dibû . Em jî bi navê xwe û komîta Newrozê hemû keç û xortên gelê Kurd pîroz dikin, serkefitin û rojên xweş ji tevan re hêvî dikin .

Dumahîk : 21ê Sibate

Lê, di dîroka gelê me yê Kurd de, gelek biryar û kiryarên windakirina vî gelî û zimanê wî hatine dan, li dawiyê, xwedanê wan biryaran çûne û gelê me li ser lingên xwe maye, zimanê xwe parastîye, ango, zimanek mîna zimanê Kurdî ku îro derdora 40 milyon mirov wî di jiyane xwe ya rojane de bikar tînin, tu carî ew bi biryarên qedexekirinê ji holê ranabe.

Eger dereng be jî, pêwîste karbidestên dewletê li biryarên xwe vegezin, bi hişmendî û berpirsiyarî têkiliyê bi vê pirsê re bikin, zimanê Kurdî mîna zimanekî fermî niştimanî bipejirînin û ji bo pêşvebirina wî defetan bibînin û ji ber biryar û kiryarên xwe yên ne mirovane yên dij hebûna gelê me û zimanê wî yê pîroz lêborînê bixwazin!

Rêberê Silivî